

BANGA VEKIRÎ

Ji bo projeyeke performatîf em li jinên pîr digerin, ku bi zimanekî di xetereyê de biaxivin.

Mothertongues /zimanên dayikan

Niha li cîhanê derdora 7,000 zimanên ku tîna axaftin hene, ji nîvê wan zêdetir di nava sedsala bê de di bin xetereya windabûnê de ne. Mothertongues / Zimanên dayikan bi hevkarîya axêverên zimanên di xetereyê de projeyeke lêkolînê ya performatîf a li ser zimanên di xetereyê de ye.

Wekî gava yekem, em li beşdarên ji bo **îqameke/ lêkolînê di Îlon / Cotmeha 2024 de li Gesnerallee Zurich** digerin. Em dixwazin bipirsin: Dema zimanekî wînda bibe çî yê wînda bibe? Û çî nayê wergerandin? Di odeya meşqkirin de em li cudahiyên ku zimanên me pêk tînin, li îfadeyên ku nayên wergerandin, û ji bilî Google Wergerê li awayên mumkin ên ragihandina hevkarîyê digerin.

Ji vê wêvetir, derfetek heye ku meriv bibe beşek ji komê demdirêj (îqameyên din, hilberandin, berkêşan, hevkarîya hunerî û naverokê).

Zanîna an serpêhatiya berê di sektora performansê / şanoyê de ne hewce ye. Lê eger we jê hebin, an jî hûn bi profesyonelî di şanoyê de bixebitin, helbet pir baş e. Rêzgirtina hev û mafê axaftinê ji bo me girîng e.

Rêveberiya hunerî

Koma li derdora şanoçêker û derhêner Rebekka Bangerter li qada şanoyê hem bi polîtîkayên zimanî, arşîvî û çîrokî re eleqedar e û hem jî bi vê pirsê ku ev mijarên pir razber çawa dikarin bi awayên lîstîk, rexneyî û helbestî werin gotûbêj kirin û çawa dikarin bigihînin.

Têkilî

Ger bala we bikişîne, pirsên we hebin an jî hûn dixwazin di derheqê projeyê de jê gelectir agahdarî bigirin , ji kerema xwe bi çend rêzikan li ser xwe bi me re têkilî danîn li ser: mothertongues@outlook.com an li ser **0041 79 650 24 11**

Şertên bi gişî

Îqame tê pere dayîn.

Zanîna Almanî ne şert e.

Axêverên nîşanan bitundî tene teşwîq kirin ku werin pêş.

Ger hewce be em jî hewl didin li wergêrekî bigerin .

Kesên eleqedar ên ku li derveyî Zurich / Swîsreyê dijîn jî bi xêr hatin ku têkevin tîkiliyê.

Ger hûn dikarin vê bangê parve bikin an rasterast ji mirovên gengaz ên eleqedar re bişînin em ê spasdar bin.

